

Nivîskar Zeynelabidîn Zinar dinirxîne: Zanîngeha Mêrdînê û beşa zimanê kurdî

Gabar Çiyan

Nivîskar Zeynelabidîn Zinar ji bo dana hejmarek semîneran çûbû başûrê Kurdistanê. Paşê bû mêvanê zanîngeha Mêrdînê û li ser xebatên vekirina beşa ziman û edebiyata kurdî zaniyarî girt û ji nêz ve bû şahidê pêşketinên li bakurê welêt. Nivîskar Zinar pêşketinên li herdu aliyên welêt ji bo me nirxand. Em hevpeyvîna pê re pêşkêşî we dikin.

- AMACA SERDANA BAŞÛRÊ KURDISTANÊ ÇÊ BÛ?

Serdana min a Başûrê Kurdistanê, ji bo du semîneran bû. Yek li Hewlêrê di 07. 06 2009, saet 17.00 dest pê dikir. Ya din jî li Yekîtiya Nivîskarên Duhokê, 09. 06. 2009, saet 17.30 dest pê dikir. Naveroka herdu semîneran jî li ser, **Niha Zimanekî Standart yan Alfabeke Standart ji bo Kurdan Divê?** bû.

Ez roja 31ê Gulanê, di ser Tirkîyê çûm. Roja diduyê Gulanê ez ji bo **TRT 6**ê hatim vexwendin û li Enqerê beşdarî bernameya WEŞANXANEyê bûm. Roja çar û pêncê Gulanê, ez li herêma Amed, Batman û Mêrdînê geriyam.

- LI BAKUR REWŞ ÇI YE?

Niha destpêka havînê ye. Zêdetir min bala xwe da zadên di zeviyên de. Ji ber ku par li heşt parêzgehan liober zan çênebûbû, lê belê îsal pir rind e. Li hin deveran dest bi dirûnê kiribûn û hin dever bi bîçeran didirûtin. Ez li çend cihan rawestiyam û çûm ba xwediye zadan, min pirsî başî û nebaşîya zad û çendtoviya wî kir. Tevan bi kenekî nerm û ruyekî şêrîn bersiva min dan, gotin: *Wele tiştê ku me ji Xwedê beglemîş (dîpa) dikir, zêdetir çêbûye. Piştî xwediye teqsiya ku min digerland, gote min: Ji bo ku çav li zadê wan nekeve, rastiya ku çend tovi bûye, xwenabêjin.*

Erê bi rastî zadê deşta Gewran, yê Deşta Bismil, Deşta Silîva, Deşta Bişêriyê, Deşta Xerza, Deşta Apikan, herêma Torê pir pir baş in. Lê zadê Deşa Mêrdînê weke yê Banî ne baş in. Min li çend deveran li simbilê zad nihêrî, bereketa Xwedê tê de be, wisa rebît û qebilî bûn ku êdî hew tê gotin. Min sedemê vê başîya zad ji çend gundiyan kal pirsî, weha gotin: *Ji xwe îsal şîfî zêde bû, lê ew toza ku ji aliyê Ereboistanê ve wek ewran dihat, ji zadên me re hemû bûye wek zibl û derma.*

- ÇIMA SEMÎNERA HEWLÊRÊ HATE BETALKIRIN?

Ez hêj negihabûm Başûr, ez bi e-mailekê hatim agahdarkirin ku semînera min a Hewlêrê bi paş ve dane û wextê wê jî kifş nekirine.

Ev semînera ku min dê li Hewlêrê di Heftê Hezîranê de dabûna, berê di 10ê Adara îsal de hatibû programkirin. Lê dema ez çûm Hewlêrê, li min kirin xewn û gotin ku me wextê wê Yekê Adarê kifş kiribû, ne dehê Adarê. Ew e-maila ku ji min re hinartibûn hêj li ba min e. Îcar niha jî ku semînera Heftê Hezîranê dane paş, êdî rind eşkere bû ku nexwestine ez semînerêke bi vî rengî li Hewlêrê bidim.

Diyar e ku hîlbijartin jî nêz dibûne, ji ber hindê min jî nexwest ku ez bi ser meselê ve herim û Medyaya Kurdî pê bihesînim. Jixwe diyar e ku li Başûrê Kurdistanê hin kes hene, hem dijayetî bi zaravayê kurmançî re dikin û hem jî dijminatî bi Alfabeke Latînî re dikin.

- SEMÎNERA DUHOKÊ ÇEWA DERBAS BÛ?

Roja Nehê Hezîranê, berî ku semînera min li Yekîtiya Nivîskarên Duhokê dest pê bike, ez ji bo naveroka semînerê hatim vexwendin ji bo televiyona Duhokê. Bi qederê saetekê pirsê derbareyê semînerê de ji min hatin kirin. Piştê em çûn Muzexana Qadir Qaçaxî. Saet 17.30 semînerê dest pê kir.

Berê Yekîtiya Nivîskaran amadetiyeke rind kiribû; di televizyon, radyo û rojnameyan de agahdarî dabûn. Herweha proşûrekê jî belav kiribûn. Gelek nivîskar, hin kesên xuyanî û çend jî jin hatibûn. Kamerayên sê kanalên televizyonan jî destûr ji min xwestin û kêşan kirin.

Bi qederê saetek û bîst deqe, axaftina min domand. Min giranî da ser alfabeyeke standart û ne zimanekî standart. Ji ber ku eger alfabeyeke standart nebe, Kurdên ku niha du alfabe bi kar tînin, çênabe ku xwe miletek bihesibînin. Qanûneke matematîkê heye, dibêjin **mirov nikare ji du pîvaz û sê hêkan re bêje pênc**. Yanî çi dibe pênc? Ha madem rewş wisan e, nexwe miron nikare bêje ku alfabeya Kurdan ev e!

Piştê ku axaftina min qediya, du nivîskar xweşhaliya xwe ji semînerê re diyar kirin. Lê Bavê Navê hin gotinên ku ji rewşenbîran red est nedidan, gotin. Piştê saet li dora 21.00ê, ez çûm Zaxoyê û roja din sibe zû derbasî Bakûr bûm.

- TU ÇÛBÛ ZANÎNGEHA MÊRDÎNÊ Û BÛ MÊVANÊ WAN...

Çewa ku ji medyayê jî hatiye bihîztir, li Zanîngeha Artuglu ya bajarê Mêrdînê **"Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî."** vedibe.

Dema ez li Başûrê Kurdistanê bûm, min qutiya xwe ya e-mailan vekir, min dît ku nivîskarê Kurd rêzdar Selîm Temo nameyek ji min re hinartiye û weha gotiye: **"...ez niha li Mêrdînê me û ji bo vekirin û avakirina Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî dixebitim..."**

Dema Selîm Temo Zanîngeha Enqerê qedandiye, doktora xwe jî her li ser Vêjeya Kurdî daye. Niha saziya Xwendina Balayê (YOK) ew vebuhtî kiriye ku li Mêrdînê projeya Ziman û Edebiyata Kurdî amade bike.

Min ev name çendî ku bi çavên xwe dît jî, lê min bawer nekir û min xwe bi xwe got ku ev birader belkî dixwaze kêfa min bîne û wisa dibêje. Lê piştê min dît ku weha nivîsiye: **"...min niha dosyeya serîlêdana YÛKê û tevî naverokan bernama dersan amade kiriye, li ber temambûnê ye..."**

Lê gotina herî zêde ku dilê min êşand, ev bû ku rêzdar Temo gotiye: **"... bitenê me..."** û weha domandiye: **"...eva deh roj in ku em bêrawestî dixebitin..."** û gotiye: **"...pêdiviya me bi her tiştî heye kekê...", "...û dema riya we bi van deran ve ket, kerem bikin bibin mêvanê me. Min xwest hem mizgîniyeke wisa pîroz bidim we, hem jî hal û rewşa xwe vebêjim..."**

Bê guman bi van gotinên rêzdar Selîm Temo, pir kêfa min hat û pê re stêrkên şahiyê jî ji çavên min daweribîn. Min pêre pêre telefonê wî kir û got ku **"ez niha li Hewlêrê me, roja dehê mehê tîm û dê li Mêrdînê peyabim werim ba te."**

Dema ez derbasê aliyê Bakûr bûm, rast çûm Mêrdînê, li Zanîngehê bûm mêvanê Selîm Temo.

Pêşî rêzdar Temo Bernameya Beşa Kurdî nîşanê min da û min beşa dersan tev xwend. Bi rastî jî bernameyeke wisan rind, dewlemend û birêkûpêk bû ku êdî hew lê dihat zêdekirin.

Dema ez li wirê bûm, sê doçent jî hatin û bixêrhatin dane min. Piştî Selîm Temo got ku Rektore Zanîngehê bi israr xwestiye ku te bibîne. Em tev rabûn çûn serdana **Prof. Dr. Serdar Bedii Omay** ku bijîşkê leşxariyê ye.

Profesor Serdarî rûmeteke pir mezin bo me nîşanda û behsa bargiraniya vê beşa kurdî û ku pêdiviya wan pir bi alîkariya rewşenbîrên Kurd heye kir. Piştî xatirxwestinê, min got Profesorî: *Em ji bo alîkariya we tiştê ku dê bikeve ser milên me, amade ne û destên we sax be.* Piştî ez hatim Swêdê, min 110 kîlo pirtûk, kovar û rojnameyên bi kurmancî yê kevn hazir kirine û dê bişînim Mêrdînê ji Beşa Kurdî re.

Rêzdar Selîm Temo, roja 03 07 2009, min agahdar kir û Rektore Zanîngehê çûye Enqerê û ew bernameya ku wî temam kiribû, wek daxwazname daye navenda Xwendina Balayê (YOK).

- ÇEND DOÇENT Û MAMOSTE DIVÊN?

Ji bo ku beşeke nû li zanîngehekê vebe, pêdivî bi sê doçent, 13 mamoste û 40 xwendekarî heye. Niha du doçent hene, lê yek kême e. Li bajarê Îzmîrê doçentekî jikaravêtî heye ku niha qehwecîti dîke. Eger ew jî here Mêrdînê, temam e. Lê gotin ku wê kêmasiya mamosteyên darsa kurdî, ji mamosteyên Zanîngeha Duhêkê temam bikin. Ji niha ve bi dehan xortên Kurd daxwazname hinartine Zanîngeha Mêrdînê û xwestine ku beşa kurdî bixwînin.

- MIMKUN E ÎSAL DEST PÊ BIKE?

Îsal di dawiya meha nehan de Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî dest bi karê xwe dîke. Lê eger astengî derkevin û dest pê neke, sala 2010 dest pê dîke.

- HAZIRÎ LI ZANÎNGEHÊN DIN JÎ TUNE?

Agahdariya ku dane min, piştî Zanîngeha Mêrdînê ku beşa kurdî vebe, zanîngeheke din jî amadetî dîke ku eynî beşa li Zanîngeha Mêrdînê veke.

- TU ÇEWA DINIRXÎNÊ?

Bi baweriya min, vekirina Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî li Zanîngeha Mêrdînê, ji bo ziman û çanda kurdî destpêka çaxekî nû ye, yanî mîladek e. Li ser xêrê be û destên wan kesan, xasma jî yê Selîm Temo sax be, serkeftin ji wan re dixwazim û li Neteweyê Kurd pîroz be.

Hêvîdar im ku rewşenbîrên Kurd, alîkariya xwe ji van zanîngehan nehêvişînin. Lewra pir tişt hene ku ne bi destê dewletê, lê bi destê kurdên zana çêdibe. Her şad û bextewer bin.

Zarathustra News – Zoroaster_news@comhem.se